# DÎHNÊN XWEZAYÊ YÊN HEEBUNÊ

-5-

«Nirx -1-»

Źibo ku meriv bikare li hawîrdora xwa źibo xwa stetuyekê b'afirîne, pê heebun u menfeetên xwa yên takekesî u komî ava bike u biparêze, hoyên ku divêt di nav civatê wekî nirx b'êne peźirandin, dihafirîne.
Nirxên takekesî yên ku di nav bêźinga civatê ra derbaz u berbelav dibin źî, yek bi yek bi hev ra nirxên komî [civatî, netewî] pêktînin.

(15.03.2012, s23:15 & 27.09.2012, s22:54, Zürich / Swîsre)

Nirxên di nav civatê da yên wekî «etîk, edet, kultur, dîn, ...» bi tevayî źî ligorî menfeet u emniyeta vê stetuya takekesî u komî [civatî, netewî] teśeya xwa digirin («kultur» li vir di wateya xwa ya «ćandinî»yê da nehatiye bi kar hanîn).

Źiber vê yekê ye ku di nav takekes u koman da hertim cihêtiyên bingehîn yên xwezayî hee ne. Źiyana her takekesî u komê [civatê, neteweyê] li ser derfetên heeyî yên di cîgeha [źîngeha] wî kesî u wê komê da ava dibe. Digel van derfetên heeyî her takekesê wê komê źibo ku bikare menfeetên xwa biparêze, dixwaze bi navgîniya nirxên nu seba xwa stetuyekê bihafirîne u wê berbelav bike.

Helbet źiber daxwaza pêk'anîna stetuyeke hilo divêt meriv usilên/tehrên tevgerrînê[1] b'afirîne u wan l' hawîrdora xwa bide qebul kirin. Lê di nav pêvaźoya hafirandin, berbelavkirin u berbelavbuna nirxên nu da, yanî źi destpêka pêkhatinê heta formên xwa yên «dawiyê» ev nirx di nav bêźinga takekesan u ya civatê ra derbaz dibin u pey bi pey teśeya xwa ya destpêkê diguherînin.

Ango nirx him elestîze u him źî guherbar in.

[1] Yanî «hoyên tevgerrînê» yên ku di nav civatê da wekî «edet» rudinin.

Wekî her tiştê di nav xwezayê da, heebuna demdrêžiya nirxan žî di žiyanê da sînorkirî ye; pêktên, berbelav dibin, diguherin, u dawiya dawîn žî dimirin.

Heebuna hemî nirxan bi pêwistiya wan ya di nav civatê da va girêdayî ye. Ži piştî nemana pêwistiya bi wan nirxên berê, hindî nirxên nu gav bi gav cî l' yên kevin teng dikin, heta ku wan rolên xwa yên di nav civatê da bi tevayî handa kirinne.

Bihêzbuna vê stetuyê, bi berbelavbun u qebulbuna van usilên/tehrên tevgerrînê va girêdayî ye. Tabî žibo vê yekê meriv timî di nav tevgerrînên textîk u streteźîk yên bedenî u psîxoloźîk da terre u tê. Di vir da her cure menîpulesiyonên takekesî u komî dikevin nav tevgerrê.

Hindek caran ev stetuya nu li ser nirxên berê/kevin tê ava kirin, yanî bê ku meriv redda wan bike, wan wekî alet žibo berbelavbuna nirxên nu bi kar tîne.

Lê hindek caran žî meriv heebuna nirxên berê/kevin bi temamî redd dike. Gava digel vê reddê stetuya «heebun u menfeet»ên śexs u komên din ziyanê dibînin, hingê di navbera van takekes u koman da pevćunên di asta bedenî da derdikevin.

*– Vegotinek –*

Mesela tirk, ereb u fars žibo ku zman u nirxên kurdbuyînê tune bikin u heebuna xwa li ser vê tunebunê pît bikin, digel zora leśkerî dîsan bi hemî dezgehên xwa yên heeyî, bi zman u nirxên xwa yên tirk-, ereb- u farsbuniyê talaneke mezin dikin. Nirxên xwa yên ku di menfeetên wan da ne, derdixin pêś, wan di ser nirxên milletê kurd ra dibînin u dixwazin ku kurd žî vê yekê hilo bibînin u hîs bikin, daku kurd ži zman u nirxên xwa śerm u nefret bikin. Źixwa heta ku di nav milletê kurd da hîsên ži zman u nirxên xwa śerm- u nefretkirinê ćênebunne, îmkana ku kurd dest ži zman u nirxên xwa berbidin, tun e. Loma žî di vir da pêk'anîna van hîsên bi śerm u nefretê va girêdayî pirr zerurî ne žibo serketina talankeran.

Tabî gava tirk, ereb u fars bi vî hawî zorê didin xwa, bivêt-nevêt zmanê xwa žî wekî pergala herî sereke ya bi xwadî nirx bi kar tînin. Źiber ku zman him pergala hafirandin u him žî ya tunekirinê ye, bikar'anîna wê ya di prextîkê da žî ew ćendî zerurî ye.

Di nav vê tevgerra bikar'anînê da hemî takekesên komê [netewê] ligorî hêza xwa xwadî mîsyoneke esasî ne, ži kesê herî bê derfet heta yê herî bi derfet. Feqîrên tirk, ereb u fars bi feqîrên kurd ra, zengînên tirk, ereb u fars bi zengînên kurd ra, zana u nezanên tirk, ereb u fars žî bi zana u nezanên kurd ra têkiliyê datînin. Źiber ku sîstema heeyî li ser zman, nirx u menfeetên tirk, ereb u farsan u tunebun u tunekirina kurdan hatiye ava kirin, hemî têkiliyên ku ćêdibin žî bivêt-nevêt roź bi roź tunebun u tunekirina zmanê kurdî, nirxên kurd u milletê kurd bi xwa ra tînin. Tevî ku bê îstîsne hemî tirk, ereb u fars di bin xizmeta vê tunekirinê da ne źî, ti kes berpirsyariya vê tunekirinê wekî ferd nagire ser xwa u bi menîpulesiyonên menfeetperestî bala kurdan dide ser sîstemê. Lê li vir «sîstem» wekî aleta bingehîn ya sucdar tê pêśkêś kirin. Bêguman hemî tirk, ereb u farsên ku «sîstem»ê źê mesul dibînin, bi xwa kevirên bingehîn yên vê sîstemê ne u hemî žî ži heebuna vê sîstema ku tenê bi wan hee ye u bi wan tevdigerre, kelkê digirin, kaarê dikin.

Her sîstem bi zmanekî u li ser zmanekî heebuna xwa ava dike. Zman di nav her sîstemê da pergala heebun u tunebunê ye, yanî bê zman ti sîstema ku bikare xwa bi xwa îdare bike, nî ye. Loma žî her sîstem dîrekt yan žî

îndîrekt herkesî mecburî zmanê xwa dihêle, źixwa ev mecburiyeta di menfeetên śexsên ku wî zmanî bi kar tînin da ye źî. Tabî li vir ti cihêtî u beramberî di navbera sîstemê u śexsên ku di nav wê sîstemê da ne, tun e; berevaźî vê, ev zman di navbera her duyan da hevahengiyeke pêbawer u girêdayîneke bi hêz pêktîne, bîr u aîdiyeteke komî/netewî dihafirîne. Źiber vê yekê ye ku sîstemên tirk, ereb u farsan ha ha van śexsên ku di nav sîstemên xwa da bi zmanê tirkî, erebî u farsî surandinne, bi rêk u pêk diśînin nav xelkê kurd, daku bila bikarin zmanê tirk, ereb u farsan di nav milletê kurd da meśru u desthilatdar bikin. Ći cure tirk, ereb u fars dibin bila bibin, źi kesê herî sosyelîst heta yê herî feśîst u niźatperest, fonksiyon u mîsyona hemiyan źî eynî ye, yek e. Źiber ku hemî źî eynî zmanî bi kar tînin u bi wî zmanî źî dikevin nav kurdan, bi tewreke źi xwa razî zmanê xwa yê rewadiyî rewatir dikin. Yanî sîstem di raśtiyê da dixwaze bi nivîskar, hunermend, ressam, muzîkźen, stranbêź, komedyen, fîlmćêker, artîst, modevan, dîndar, hêvoźer, mamoste, siyasetvan, roźnamevan, kovar, têlevîziyon, redyo, sport, u bi hemî śexs u dezgehên xwa va pêwistiyên kurdan yên xwezayî bi zmanê xwa haś bike, bikeve ruhên wan, wan di mêźiyên wan da tarumar bike.